

Hejmara - 190

Bê dirave

MIZGÎN

15 Tebax 2025



Naverok

1 Wênesazî

2 Wêjeya Zarokan

3 Lîsk

4 Welatê me

5 Tu dizanî

6 Tendirustî

7 Tîp û gotin

8 Navdar

9 Bexçeyê Navan

10 Jîngeh mala me ye

11 Jêhatiyên Zarokan

12 çîrok

16 Bixwînin û fêr bibin

17 Çavika Mizgîn

Amadekirina Naverokê
Amir Ferso

Dîzayn
Mecid Alsadûn

Şêwekar
Umer Ishaq
Xalid Bîco
Baran zagros
Rojhilat

Sererastkirina Kurdî
Mihemed Xanim

Sererastkirina Erebî
Abdulah Rehîl

Instagram Kovara Mazgîn

Facebook Kovara Mazgîn مجلة مزكین

لَوْنِ المِظلة كما في الرَّسْمِ المُرْفِقِ. Sîwanê wekî wêneya li jêr reng bike.



ZOZÊ ÇÛ DIBISTANÊ
 Zozê çû dibistanê
 Hûr hûr bibar baranê
 Keziyê Zozê dirêj e
 Badaye bi qeytanê

Zozê keçek zîrek e
 Şêrîn e çavbelek e
 Her timî ew li pêş e
 Çi bêjim ne gelek e

Tîpên kurdî dixwîne
 Gotinan lihevdu tîne
 Zimanê wê şîrîn e
 Qendav e hingivîn e

Hevalên Zozê pir in
 Hezkar in ne bi gir in
 Şevê Hêlîn û Xebat
 Wek çivîkan difirin


Bavê Zozê cotkar e
 Xaka wî tev bidar e
 Dema Zozê tê malê
 Gul ji dêman dibare

Leyla Reşo



Wêneyê tamam bike

أكمل الرسمة





Keleha Hekarî

Keleh li bajarê Hekarî yê Bakurê Kurdistanê ye, ev bajar gelek çiyayên bilind û geliyên kûr e lê hene û bi hezarê salan e ku Kurd lê dijîn. Keleh ji kevirên reş ên xweristî hatiye avakirin, di demên berê de ji aliyê mîrên Kurdan ve hatiye niştecîhkirin û birêvebirin. Hekarî ji bo zanyar û pîşeyên kevneşopî navendeke girîng bû.

Di çîrokên kevnar ên Kurdan de tê gotin ku yek ji mîrên kelehê xwediyê hespekî reş ê pir xweşik bû ku kes nikaribû bigire. Ew bi lez ji kelehê dadiket gundan da ku rewşa mirovên wê nas bike û berî rojavabûnê vedigeriya!

Heta îro ji zarokên li Hekariyê dibêjin: "Di kelehê de hespek heye ku tenê ji kesên ku ji çiyayan hez dikin re xuya dike!"

قلعة هكاري

تقعُ القلعةُ في مدينة هكاري، في باکورِ كُردستان، التي تكثرُ فيها الجبالُ العالية، والأودية العميقة، ويسكنها الكُرد منذ آلاف السنين.

القلعة مبنية من الحجر الأسود المتين، وقد سكنها قديماً أمراء كُرد، ويديرون شؤونها. وقد كانت هكاري مركزاً مهماً للعلماء، والحرف التقليدية.

في حكايات الكُرد القديمة، يُقال: إنَّ أحدَ أمراءِ القلعة كان يملك حصاناً أسود رائعاً، لا يستطيع أحدٌ اللحاق به. وكان ينزل من القلعة إلى القرى بسرعة، ليُطمئن على أهلها، ويعود قبل غروب الشمس! ويقول الأطفال في هكاري حتّى اليوم: "في القلعة حصان لا يظهر إلا لمن يحب الجبال!"

Hûn dizanin çima dengên firindeyan ji hev cûda ne?

Ji ber ku her firindeyek xwedî dengêkî taybet e ku dişibihe zimanê wî!
 Firinde dengê xwe bikar tînin da ku bi hev re têkiliyê deynin. Hin ji wan ji bo nîşandana kêfxweşiyê distirên, hin ji wan ji bo hişyarkirina li ser xetereyê diqîrin û carinan jî yek gazî hevalekî xwe dike an jî li xwarinê digere.
 Hin firinde wekî bilbilan dengên xweş ku dişibe mozîkê derdixin, hin firinde jî li gorî jîngeh û xwezaya xwe dengên ecêb an jî komîk derdixin.

هل تعلم، لماذا تختلف أصوات الطيور؟

لأن لكل طائر صوته الخاص الذي يشبه لغته!
 الطيور تستخدم أصواتها؛ لتتواصل مع بعضها، فبعضها يغني ليعبر عن الفرح، وبعضها يغرد ليحذر من الخطر، وأحياناً ينادي أحدهم صديقاً، أو يبحث عن طعام.
 وبعض الطيور مثل، البلابل والعنادل تصدر أصواتاً جميلة تشبه الموسيقى، بينما طيور أخرى تصدر أصواتاً غريبةاً أو مضحكة حسب بيئتها وطبيعتها.



Tu dizanî?
 هل تعلم؟

TIRÎ

Sûdên tirî ji zarokan re:

Te cribandiye ku tu di rojê germ de tiriyê sar bixwî? Ew xweş û teze ye. Ma te dizanibû ku ew gencîneyeke ji sûdên tenduristiyê ye?

Mejî têt dike û hizrkirin û baldariyê bilez dike. Bi fîberên ku gedeyê paqij dike û alîkariya pergala hilandinê dike, dewlemende Vîtamîna C û antîoksîdan dihewîne ku pergala parastinê xurt dike û mirov ji zekemê diparêze. Gelek av tê de heye, ji ber vê yekê ji bo şilkirina laş, nemaze di havînê de, girîng e. Hevalno, tiriyê kesk, sor, reş û zer hene... û hemî jî bisûd û xweş in! Hûn dikarin wan bixwin an jî şîrava wan vexwin. Şîreta tenduristiyê: Berî xwarina tirî wê baş bişon.



العنب


فوائد العنب للصفار:

هل جربت أكل العنب البارد في يوم حار؟ إنه لذيذ ومنعش، لكن هل تعلم أنه أيضا كنز من الفوائد الصحية؟

يغذي الدماغ، ويساعد على التركيز والتفكير السريع. غني بالألياف، التي تنظف بطنك وتساعد على الهضم. فيه فيتامين C ومواد مضادة للأكسدة، التي تقوي جهاز المناعة، وتحمي من الزكام. فيه الكثير من الماء، ما يجعله هاما لترطيب الجسم، خاصة في الصيف. يا أصدقاء، يوجد عنب أخضر، وأحمر، وأسود، وأصفر... وكلها مفيدة ولذيذة! يمكنكم أن تأكلوه، أو تشربوا عصيره. ونصيحة صحية عليكم غسل العنب جيدا قبل تناوله.




Hevalên hêja, tîpên kêma temam bikin; ji bo ku hûn navan li gorî wêneyên wan temam bikin.



			x			
--	--	--	---	--	--	--

			a	
--	--	--	---	--



			n			
--	--	--	---	--	--	--

			î
--	--	--	---



LEYLA ZANA

ليلى زانا



Ew di sala 1961'an de li gundekî biçûk ê nêzîkî bajarê Amedê li Bakurê Kurdistanê ji dayik bû. Di jîngeheke sade de mezin bû û dema biçûk bû zêde neçû dibistanê, lê ew teslîm nebû, piştî wê xwe fêrî xwendin û nivîsandinê kir!

Ew di sala 1991'ê de bû yekem jina Kurd ku ket Parlamentoya Tirkiyeyê, ew li ber her kesî rawestîya û bi zimanê xwe yê kurdî ku qedexê bû axivî û got: "Ez ji bo biratiya gelên Kurd û Tirk sînd dixwim", ew kêliyêk pir wêrek bû!

Ji ber gotinên wê yên wêrek, deh salan di zindanê de ma, lê ew bêhêvî nebû. Wê ji zindanê nivîsand û ji bo aştî û mafên jinan û gelê Kurd parêzvanî kir. Wê di sala 2004'an de azadiya xwe bi dest xist û ji bo wêrekî û sekna bi rastiyê re xelatên navneteweyî wergirt.

ولدت سنة ١٩٦١ في قرية صغيرة قرب مدينة آمد في باكور كردستان، نشأت في بيئة بسيطة، لم تذهب إلى المدرسة كثيرًا، وهي صغيرة، لكنها لم تستسلم، بل علمت نفسها القراءة، والكتابة لاحقًا! حتى أنها أصبحت أول امرأة كردية تدخل البرلمان التركي سنة ١٩٩١، وعندما وقفت أمام الجميع، قالت كلمة بالكرديّة، وهي لغتها الأمّ، التي لم يكن مسموحًا بالتحدث بها، وقالت: "أقسم من أجل أخوة الشعبين الكردي والتركي" وكانت لحظة شجاعة جدًا!

وبسبب كلمتها الجريئة، أرسلت إلى السجن عشرة سنوات، لكنها لم تياس، بل كانت تكتب من السجن، وتدافع عن السلام وحقوق المرأة، والشعب الكردي. نالت جريتها سنة ٢٠٠٤ وحصلت على جوائز عالمية، لأنها كانت شجاعة، ووقفت من أجل الحق.

Hin Navên bi tîpa -S

Sorxwîn

Sozdar

Sason

Salar

Sîpan

Stêrk

Sara

Sîdar

Serxwebûn

Dîwarên bajarê min... Ne lênûska min e

جدرانُ مَدِينَتِي... لَيْسَتْ رَفْنَرِي



Te rojekê xêz û nivîsên li ser dîwarê dibisatn û bexçeyan dîtiye? Dibe hin zarok bifikirin ku nivîsandin li ser dîwaran kêfxweşiyê, lê di rastiyê de, ew xweşkûnê xerab dike û bê dilê gelek kesan e.

Çima pêwîst e em li ser dîwaran nivîsîn? Ji ber ew ne lênûsekeke yan tabloyê xêzkirinê ye, ew perçeyek ji xweşkbûna bajêr e.

Nivîsandin li ser dîwarên dibistanê teşeya wê xerab dike û paqijiya wê kêm dike. Paqijkirina xêzên li ser dîwaran dem, westandin û pereyan dixwaze.

Dostên delal, bajarekî paqij tê wateya ku em rêzê li hev digirin û li cîhekî xweşik û rehet dijîn!

هل رأيت يوماً كتاباتٍ أو رسوماتٍ على جدرانِ المدرسة أو الحدائق؟ قد يظنُّ بعضُ الأطفالِ، أنَّ الكتابةَ على الجدرانِ ممتعةٌ، لكنَّها في الحقيقة تشوُّهُ المنظرَ، وتزعجُ الآخرينَ.

لماذا يجبُ ألا نكتبَ على الجدرانِ؟ لأنَّها ليستُ دفترًا أو لوحةً رسمٍ، بل جزءًا من جمالِ المدينةِ.

الكتابةُ على جدرانِ المدرسةِ، تُفسدُ شكلها، وتجعلها أقلَّ نظافةً.

وتنظيفُ الجدرانِ المرسومِ عليها يأخذُ وقتًا وجهدًا، ويكلفُ المالَ.

يا أصدقاءَ المدينةِ النظيفةِ، تعني أننا نحترمُ بعضنا، ونعيشُ في مكانٍ جميلٍ، ومريحٍ!

Hevalno, eger pisîkeke xweşik ku diaxivî li mala we hebe, ew ê çi ji we re bêje?
با أصدقائكم لو كان في منزلكم قطة جميلةً بكنكم! ماذا പറی سيقول لكم؟



Mala Amir Ferso dibêje:

Pisîka min a şîrîn bi çavên xwe yên biriqok li min dinêre û bi dengêkî nizm dibêje: Tu çawa yî hevala min? Were em bi lîstoka veşartokê bilîzin. Ezê xwe veşêr im û tûyê li min bigerî.

مالا عامر فرسو تقول:

قظتي الطريفة تنظر إلي بعينها اللامعتين وتهمس:
كيف حالك يا صديقتي؟ هيّا نلعب لعبة الضميمة! أنا أختبئ وأنتِ
تبحثين عني.

Aram Amed Mihemed dibêje:

Pisîka min a nazik xwe li pêş min vediguzîne û bi dengêkî nazik dibêje:
Aram, tu çawa yî? Tiştekî xweş li cem te heye? Ez hinekî birçî me.

آرام آمد محمد يقول:

قظتي اللطيفة ستتمطئ أمامي، وتقول بصوت ناعم:
كيف حالك يا آرام؟ هل عندك شيء لذيذ؟ أنا جائعة قليلاً.



Şîlan Sei'ed Ehmed dibêje:

Pisîka min a xweşik xwe li pêş min çem dike û dibêje:
Ka em herin baxçê malê? Ez dixwazim wêneyek bi te re bigirim û kenê min yê taybet li ser rûyê min be.

شيلان سعد أحمد تقول:

أما قظتي الأنيق فسيقفز أمامي ويقول:
هيّا لنخرج لحديقة المنزل؟ أريد أن ألتقط صورة معك، وأنا ابتسم ابتسامتي المميّزة.



Çîroka : Li Bazarê



Erê, dayê.

Em ê îro biçin bazarê!
Lê divê em li ser hin
rêgezan li hev bikin.



Pêşî, her tim li kêleka
min be.

Ez têgihîştîm
dayê!

Ya duyemîn, di korîdoran
de baznede da ku tu
nekeve erdê yan li kesekî
nekeve.

Ez ê hêdî
bimeşim.





Ji bîr neke, bêyî destûra min dest nede tiştêkî.

Waw! Çiqas xweşikê!



Sêyem, eger te hîz kir ku tu winda bûye li cihê xwe bimîne û li benda min be.

Erê dayê.



Bê guman, dayê.

Bi kesên nenas re neaxive û bi wan re neçe.



Em ê tenê li ser tiştêkî li hev bikin, bê destûra min tiştêkî negire.

Ez vê şêraniyê dixwazim!



Spas dayê.

Ji ber ku tu birêz bûyî û
rêgez şopandin, şêraniya
tu jê hez dike, ez ê
bihêlim tu hilbijêre




Dema em pera
bidin baldar be
û dûrî min
neçe.

te baş kir!
Hevkarî pir
baş e.



Ez jî dikarim
alîkariya te
bikim!

Ez ê li kêleka
te bim.



Ji ber ku min hemû rêgez şopand.

Tu zarokekî berpirsyar û xwedî reftareke baş bû.



Herdem ewlehiya te tişa herî girîng e!




Çûna bazarê xweş e, lê ji bîr neke ku herdem ewlehiya te di rêza yekem de ye.


Çûna bazarê xweş e dema ku em baldar bin û ez ji bo cara bê amade me.



Holik
كُوْحُ
Cottage



Xewxane
فُنْدُقُ
Hotel



Koşk
قَصْرُ
Palace



Mal
بَيْتُ
House

Çavika Mizgîn

عدسة مزكین



العدد - 190

مجاناً

مزكيز

15 - آب - 2025

